# Newroz



*Dr Nûredîn Zaza*
*1919- 1988*



*Osman Sebrî*
*1905 - 1993*

*Xebat ji bo* : * **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .**
* **Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .**

***Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê -*** **YEKÎTÎ**

***Hejmar (103 ) sal 18 Hizîran 2012 z - 2624 k Buha ( 15 )ps P.S***


# Nêrînek ji navça Helebê

" Ax bira…! Hin caran hestek bi min re
Çêdibe , ku ez tiştekî bi (………) rijîmê re
bikim , mîna ku bi me dikin…..lê ,dîsa ez vedigerim
diponijim …..,ku tucarî hemwelatiyê normal
nikare têgihe , çima em şoreşa xwe hildidin
Eger emkê bi kiryarên mîna yê rijîmê rabin."

Piştî borandina panzdeh heyvan di ser şoreşa Sûriyê ya pîroz re, rijîmê ji bo çareseriya rewşa hundir sûriyê , şêweya tund û tûjî û leşkerî daye ber xwe û her tê de rikdar û berdewam e . Ew hemî cureyên çekên sivik û giran ên tarûmarkirinê li gund û bajarên Sûriyê bi kar tine, ta ku li vê dawiyê , gihîşte lêdana gelek deverên welêt bi tang û topên giran , li rex wê hewildide ku welêt derbasî şerekî navxweyî kirêt û çepel bike, bi hêviya bi wê temenê xwe dirêj bike.

Li rex vê giştî , rijîmê rewşek ji tirs, fewdelîzim û serberdan a asayî afirand, wek belavbûna rûdawên gulebarandin û avêtina qurşîn û fîşekan bi awakî tewşankî û bombekirina di deverên xelk lê heyî de, li hemî ciyan û deman de, Herweha kuştin û vedizîna mirovên sîvîl , dizîn û şelandin li nav û derdora bajarê Heleb herdiçe pir dibe , û nûçeyên wan bûyerên kambax aniye holê li bajarê heleb rojane ne.Ev ton rewşa ku rijîma ewlekarî û zordariyê ,welat û hemwelatî derbasî qonaxeke tirs , nevehesî û nehêminiyê **D.R.( 11)**


*Email : Newroz 95 @ hotmail . com*



**Pêşî, dest destan dişo Paşê, ser çavan dîş0** **4**
**Rêberê Silîvî**

**Sambola pêdarî û rêzgariyê?** **6**
**Enehîte Murad**

**Gotina Komeka Rewşen Bedirxan** **8**
**Bêrîvan Îbo**

**Gotina Encûmena Niştîmanî ya Kurd** **9**


www.arsivakurdi.org

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

## Heval Mihemedê Mihemed(Bavê Piling) Çû ber dilovaniya Xwedê

Berbanga roja Pêncşembê 14.06.2012an, li bajarê Qamişlo, bi temenê 82 salî heval Mihemedê Mihemed(Bavê Piling) çû ber dilovaniya Xwedê. Bi beşdariya gelek heval, dost û merivan li goristana taxa Hilêliyê hate veşartin û bi navê rêxistina Cizîrê ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (P.Y.D.K.S) bi zimanê Kurdî derbarê kar û xebata gorbuhuşt ji beşdaran re hate pêşkêşkirin.



Hevalê Mihemed ji sala 1975an ve tevlî xebata rêxistinî bûye, bi armanca pêkanîna azadî, aştî û wekheviyê û misogerkirina mafên xebateke îjdil kiriye û ta roja dawiya temenê xwe di nava rêzên partiya me de weke heval xebata kurdewariyê berdewam kiriye.
Bila cihê wî buhişt be, sere malbat, dost, heval û hogirên wî sax be!.

*************************

## Birêz Abdurrehman Alûcî

Sekreterê Partiya Demokratiya Kurdî –Sûriyê
Endamê Sekretariya Giştî ya Encûmena Niştimaniya Kurdî li Sûriyê
Xatirên dawî xwestin

Li Paytexta Kurdistana Îraqê, bajarê Hewlêrê, roja Pêncşembê 24.05.2012, birêz Abdurrehman Alûcî piştî nexweşiyeke giran çû ber dilovaniya Xwedê. Roja Înê 25.05.2012 bi beşdariya hezaran kes, ji welatparêzên Kurd, rêxistin û partiyên tevgera Kurdî û ya niştimanî Sûrî li bajarê Hesîça bi dilên kul, hisret û xemgîniyeke giran hate veşartin.
Mamoste Abdurrehman sala 1950 li bajarokê Amûdê ji dayik bûye. Xwendina seretayî û ya navîn lê bi dûmahî dike paşê diçe bajarê Hesîçe, li wir xwendina xwe ya Bekelorya diqedîne û sala 1972an Diploma di ziman û wêjeya Erebî de ji zanîngeha Şamê werdigire û dibe mamostayê zimanê Erebî.



Ji sala 1967an ve, dibe endamê Partî, sala 2007an, dibe Sekreter, sala 2011an, careke din weke Sekreterê Partiyê tê hilbijartin.
Ji karê xwe pir hez dike, şagirtên xwe yên Kurd bi derd, êş û bindestiya gelê wan hest dike û li devera xwe ji wan re dibe mînak û nimûne. Şagirtên wî jê hez dikin û gelek ji wan bi tevgera Kurdî ve têkildar dibin.
Gelek gotin, birûsk û name di bin kon de hatin xwendin, yek ji wan, behînameya weşana NEWROZê bû, li jêr em deqa wê diweşînin:

********************************

## Behîname

**Serokatiya Parta Demokrat a Kurd-Sûriya**
**Malbata xebatkar ê hêja Abdurrehman Alûcî**
**Encumena Niştimanî ya Kurd Li Sûriyê**

Bi dilekî tev kul û xem, me nûçeya reş a koçkirina têkoşerê Kurd ê navdar Abdurrehman Alûcî bihîst.
Bê goman e ku koçkirina rêzanekî dilsoz û welatparêz mîna mamoste Alûcî di vê qonaxa hestiyar de, ji doza gelê me yê Kurd û xelkêm Sûriyê bi tevayî re têkçûn û ziyaneke mezin e. Lê belê di heman demê de baweriya me ew e ku wekî her car, dê gelê me bi lez birînên dilê xwe derman bike û xebata xwe ya aştiyane ji bo bidestxistina mafên xwe yên dadmemd û rewa berdewam bike.
Di vê şîn û behiyê de, di komîta weşana NEWROZê de em xwe hevparê derd û xemên we dibînin.
Bila serê gelê Kurd û xebatkarên wî yên dilsoz sax be!.
Serê malbat, heval, dost û hogirên wî sax be û cihê wî buhişta rengîn be!.
25.05.2012Z

**Komîta weşana NEWROZ**

www.arsivakurd.org

***Deqa Pîroznameya Encûmena Niştimaniya Kurd Li Sûriyê ji Kongira pêncemîna awarte ye Partiya Yekîtiya Demokrat(P.Y.D) re, ji bal birêz Mustefa Meşayix ve hate xwendin:***

## Pîrozname

Xwişk û birayên hêja,
Birêvebir û endamên kongira pêncemîn a awarte ya Partiya Yekîtî a Demokrat (P.Y.D),
Beşdarên birêz…



Bi navê Komîta Peywendiyên hevbeş a Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê, em kongira we pîroz dikin, hêvîdar in ku hûn di kar û bar û biryarên xwe de dûrbîn û serkeftî bin.

Bêgomane ku kongira we di dem û rewşeke taybet û hestiyar ji dîroka welatê me Sûriyê de tê li darxistin. Ji alîkî ve, şoreşa Sûriyê ji salek û sê mehan ve li dar e û ber xwe dide, bi armanca pêkanîna azadiyê û parastina rûmeta gel têdikoşe. Ji aliyê din ve, rejêma Sûriyê a totalîter û tek-partî, bi hovîtî wê tepeser dikie û xwîna gel dirijîne, gund û bajaran topbaran û wêran dike, ji tund û tûjiyê pê ve, tu awayên çareseriyê nas nake!!..

Me Kurdan, ji hemû pêkhateyên Sûriyê bêtir zor, sitem û çavsoriya rejêmê dîtiye, bi agirê kîn û zikreşiya şovenizmê hatine şewitandin!! …Ji ber wilo jî, ji roja pêşîn a şoreşê ve em di nava rêzên wê de ne û me gelek pakrewan û qurbanî li ser rêya azadiya gel û welatê xwe danîne. Her me hewl daye, hê jî ji bo çareserkirina doza Kurd a dadmend û misogerkirina mafên gelê xwe di makezagona bingehîn de em kar û xebatê dikin.

Xwişkino…Birano

Di baweriya me de, îde dem hatiye ku em Kurd bi hemû rêxistin, partî û hêzên xwe ji dil û can hewl bidin ku deng û rêzên xwe bi yek bikin û ji bo berjewendiyên gelê xwe yekîtiya mezin ava bikin, destan bidin hev, baweriyê bi hev bînin û bi yek dengî daxwaza mafên gelê xwe bikin û vê derfeta zêrîn ji destên xwe bernedin.

Bila em weke her car bi dek, dolab û sozên neyarên gelê xwe neyên xapandin û nekevin feq û davên wan, bila em nebin ardiwê tenûra wan!..Bila em hînî çanda ji hev hezkirinê bibin, rêz û rûmeta hev biparêzin û em bawer bin ku em bi hev mezin dibin û birîna dilê me yek e!!..

Li dawiyê, omîda me ewe ku ew belgeya têgiştinê di navbera Encûmena Niştimanî Kurd li Sûriyê û Encûmena Gel a Rojavayê Kurdistanê de hatiye imzekirin, bê parastin û rêzgirtin da ku em hemû bi hev re karibin aştî û hêminiya deverên Kurdî biparêzin û rê nedin xêrnexwazên gelê me ku weke her car me bi hev bidin şikandin!!.. Û ji bo pêkanîna azadî, aştî û wekheviyê em bi hev re xebateke hevbeş bikin.

Careke din, em serkeftinê ji kongira we re dixwazin birano.

-Serkeftin ji şoreşa Sûriyê ya aştiyane re!.
-Bijî xebata hevbeş ji bo bicihanîna mafê çarenûsî ji bo gelê me yê Kurd li gora zagon, belge û peymanên navnetewî!.


15.06.2012 Z

**Komîta Peywendiyên hevbeş a Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê**

****************************

**Seyah Xelîlê Ismayil**
**Çû ber dilovaniya Xwedê**

Di roja 4ê Gulanê 2012 an de, kesayetiya civakî û niştimanî, **Seyah Xelîl Ismayil** li gundê Sîha biçûk, herêma Qamişlo çû ber dilovaniya xwedê.



Rehmetî di sala 1934 an de ji dayik bûye, û di destpêka temenê xwe de derbasî partiya Komonîst a Sûriyê bûye, lê di van salên dawî de bû ji piştgirên doza gelê xwe yê kurd,
Rehmetî li goristana Sîha mezin û bi beşdariya komîta şaxê ya Encumena niştimanî ya Kurd li devera Sinceqê hate veşartin....
Xwedê wî bi dilovaniya xwe şabike û aramê bide malbat, kes, dost û merivên wî û bila serê wan sax be.

www.arsivakurdi.org

**SFPZK civînek fereh li bajarê Efrînê li darxist**

Li roja 18.5.2012, bi amadebûna dora 25 nûnerên komîteyên mamosteyên zimanê Kurdî li deverên Çiyayê Kurmênc/Efrînê, ku di çarçewa "Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê (SFPZK)" de dixebitin, civînek fereh li bajarê Efrînê hat li darxistin.

Civînê bi bêhnikek bêdeng ji bo rûmetkirina xwîna qurbaniyên azadiyê dest pê bû.

Pişt re, rewşa tevahî ya karê saziyê ji hêla berpirsyarê saziyê û komîta navçê û nûnerên mamosteyan de hat nasandin û nirxandin .

Hat nasîn, ku li dîroka roja civînê, dora 20 komikên fêrkirinê li dar in, û 119 şagirt tê de dixwînin, û di paşerojê de dê gelek komik û korsên din jî werin vekirin.

Tiştê balkêş ew bû, ku hejmareke baş ji keçikên mamoste li civînê amade bûn, û cihê xwe di komîta nû ya navçê de jî girtin. Nêrîn û pêşniyar ew bû, ku li paşerojê, jin û keçik serkêşiya karê fêrkirin û parastina zimanê xwe bikin û her kesk ji hundur mala xwe de dest pê bike .

Mamosteyan li xwe girtin ku bareyek ji bo fêrkirina zimên bi navê ((Hawara Zimanê Kurdî)) di navbera serê meha Tîrmehê û dawiya Tebaxê de were destpêkirin.

Biryar hat girtin jî ku komikên mamosteyan li her deverkê û gundekî werin avakirin. Dirûşm wiha bû: " li her gundekî mamostak, û li her gund û taxekê maleke zimên ."

Ji bo xercî û diraviyê jî mamosteyan tibabeke mehane ye biçûk li xwe girtin.

Li dawiyê komîtek rêvebir ji mamosteyên keç û xort, ji bo lisazxistina karê saziyê li navça Ç. Kurmênc re hat vebjartin.

Li dawiyê, civîn bi sozê xebata ji bo parastina zimanê Kurdî yê şêrîn û giranbiha bidawî bû.

**Sazkarê komîteya (SFPZK) li Ç.Kurmênc/Efrîn...**

**Rozad Elî...**

Efrîn.. 20.5.2012

## Pîrozname

Bi buneya serkeftina serokê Firansa, sekretêrê partiya P.Y.D.TS . Ev pîrozname rêkiribû:

**Ji birêvebiriya Parta sosyalîst a Firansî re ……**

**Silav û rêz …….**

Serkeftina Parat we di helbijartinên serokatiya Firansî de , li ba heval û hogirên parta me li Sûriyê , ciyê şahiyeke balkêş bû , bi hêviya ku birêz Firansiwa Holand , partî û alîgirên wî di xizmet gelê Firansa û pirsa aştî , azadî û wekheviyê de , her û her serfiraz û li pêş bin .

Em bi dilgermî gelê Firansî û serokê wî yê helbijartî Firansiwa Holand pîroz dikin û jiyaneke dirêj bona pirsa dostaniyê , mafên mirovan û gelan , ji we re dixwazin .

Digel ciwantirîn silavan

**Mihyedîn Şêx Allî**

**Sekretêrê parta yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

**Bersiva wî jî ev bû**:

**Nama Jean-Christophe Cambadélis ji bo Muhidîn Şêx Alî**

**Muhidîn Şêx Alî**
**Debîrê giştî yê**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**
**Parîs 23 Gulan 2012**
**Debîrê Ewrupa û yê peywendiyên navnetewî**

Debîrê giştî yê berêz‹ Cenabê François Hollande pîroznama we derheqa hilbijartina wî ji bo Serokatiya Komarê girt. Bi navê wî û bi navê Partiya Sosiyalîst a Frensizî, ez ji bo wê nama dostaniyê, sipasdarê we me.

Ez bawer im ku hilbijartina François Hollande guhartineka nû wê bide Fransa, di warên dozên giştî de, çi Ewrupî, û çi dewletên Rohilata Navîn.

Ez, di rêya vê namê re, dostaniya me ya kûr beramberî miletê Kurd nîşan didim; her wiha jî, em piştgir in ji kesên ku ji bo guhartineka demokratîk li Sûriyê re kar dikin. Germtirîn silavên me ji we re

**Jean-Christophe Cambadélis**
**Debîrê netewî ji bo Ewrupa û peywendiyên navnetewî**

www.arsivakurdi.org

# Pêşî, dest destan dişo
# Paşê, ser çavan dişo

**Rêberê Silîvî**

Çendî mirov di pîşesazî û teknolojiyê de pêşve biçe jî, her divê ew li kultûr, wêje û zargotina bav û kalên xwe vegere, wê bixwîne û lê hûr bibe, ji ber ku ew kultûr encama ezmûn û xebateke dûrdirêj bi jiyanê re ye û cihê xwe di civakê de girtiye, ango mirov dikare bibêje zargotina gelan, dibistana bingehîn a zanînê ye, ew mîna ava kaniyeke zelal e, pêwiste car bi car mirov lê vegere û ava zelal û şêrîn jê vexwe.

Dema mirov meteloka Kurdî ya jorîn bi hûrbînî dixwîne, di gelek waran de sûdê jî werdigire. Wateya wê ya bingehîn ew e ku divê berî her tiştî mirov bi kêrî xwe û kufletê mala xwe bê, paşê bi kêrî dê û bav, xwişk û bira, pismam, gel û welatê xwe were. Ev yek nîşan dide ku giring e mirov tiral û bê kar nemîne, di ber kufletê mala xwe de xebatê bike da ku çavên wan ne li deriyan bin. Vêca, ew destên ku pêşî hevûdu neşon, nikarin ser çavan jî bişon, ew hemû di nav qilêr û gemarê de dimînin!!.

Îro ji her demê bêtir pêwistiya me Kurdan bi bikaranîna naveroka vê metelokê heye. Giring e rewşenbîr, zana û siyasetvanên me Kurdan li civaka xwe vegerin, lêkolînên zanistî çêkin, kok û jêdera êşên civakê nas bikin û jê re derman peyda bikin. Meger ev zaniyar û rewşenbîr li rewşa civaka xwe xwedî dernekevin û beşdariyê di saxlemkirina wê de nekin û bi kêrî wê neyên, ma gelo ewê bi kêrî kê bên û wê kî li civaka wan xwedî derkeve?!!..

Metelokê gotiye, pêşî dest destan dişo…Ango berî her tiştî, divê mirov bi kêrî xwe û kesên xwe yên nêzîk bê, divê em ji bo saxlemkirina civaka xwe ya Kurdî bixebitin, nerîn û baweriyên çewt jê bavêjin wek çawa cotyar baxçeyê xwe axşûv(eşêv) dike, tûmên geyayên ziyandar radike davêje, divê em jî wan nerîn û bweriyên şaş ku bi demê re di civakê de cih girtine bi zanistî hilkin û ji holê rakin. Erkê rewşenbîr, civaknas, rêxistinên rêzanî û komelên mafên mirov e ku hezkirin û rêzgirtina Kurd ji Kurd re di civakê de bi cih bikin, pênûsên xwe di vî warî de bixebitînin, ji ber ku meger em li hev nebi xwedî, rêz û rûmeta hev weke Kurd nas nekin, emê rêz û rûmeta civak û gelê xwe jî nas nekin..

Di dîroka gelê me de, nexweşiyên derûnî yên mîna berberî, kîn û zikreşiyê her dem bûne egerên peydabûna şerên xwe-xwetî û birakujiya malwêran!!..Divê em bi erzanî li xwe û birayê xwe yê Kurd ne nerin û em bawer bin ku em ji xelkên dinyayê ne kêmtir in. Di rojhilata navîn de em miletekî xwedî dîrokeke berz û naskirî ne, neviyên Horî, Med û Mîtan in, xwedî zimanekî dewlemend û payebilind in…Bila em bi çavekî biçûk li xwe û gelê xwe temaşe nekin, ji ber ku dema mirov xwe qels û kêm bibîne, mirov xwe erzan jî dibîne!!..

**Bila hemû pênûsên me yên dilsoz çi bi zimanê Kurdî û çi jî bi zimanê Erebî ji bo belavkirina çand û nirxên mirovheziyê di civaka Kurdî de binivîsin, bila em bawer bin ku em hemû bi hev mezin dibin. Bila baweriya me bi me hebe, em ji dîroka xwe sûdê wergirin û di destê kesekî yan aliyekî de nebin destik û gelê xwe pê ne êşînin, em bi hev re bira, dost û nerm bin û bi neyarên gelê xwe re mêrxas û cegerdar bin. Bi demê re, emê karibin yekîtiya gelê xwe ava bikin, dengê xwe bikin yek û rûmeta gelê xwe ya netewî bi vê lihevkirinê biparêzin û ala gelê xwe, ala aştî, azadî û wekheviyê li cîhanê bilind bikin..!!.**

**Sêşemb 19.06.2012**

www.arsivakurdi.org

# Sambola Pêdarî û Rizgariyê

**Enehîte Murad**

Di dema ku dagirkerên dewiletên xeribê (rojava)li dora perçên laşê imperetoriya osmanlî requsa serkefitinê dikirin,û bi ser wê de jî dewleta yonanê êrişên xwe li dû hev bê westan li ser tirkan gur dikirin û gelê Ermenî jî di wa destnavê de ji xwe re keys didîtin û şerê xwe li dij tirkan radigehand, daxweza wîleyeta (Qars) û (erdehan) dikirin.!

Di nêv va tovanê de dewalta tirk pêrişan û hejar diket, hema-hema jiyana dewleta tirkan li ber deriyê hilweşandinê bû! Di van merc û hoyên zor dijiwar de, (atatirk) bi holê dikevê ,ew bi hişmendî diponijî ku çareserîkê jî van serpêhatiyan re bibîne! Wî ji bilî gelê kurd tu çareserî nedidît? Her wisan jî, li seranserî gund û bajarên Kurdistana tirkiyê digeriya û gotinên gerim û balkêş weha digotin:

Ey gelê Kurd. birayên mislman! Va ye dagirkerên kafir û ne miroune birayên we tirk mislman dane ber xwe , û girînge win baş zanibin ku, daxwez û merema van kafiran ku mislmanan tev tarûmar bikin ! bêgûman ew cudahî di nêv bera mislmanên Tirik û Kurd de nîne lewre jî , bila win bawer bin ku îro bi soz û peyman ez sûnd dixim eger Kurd di va astengê de li rex birayên xwe Tirik alîkar bin, em Tirik tu carî qenciya we Kurdan ji bîra nakin û emê mafên we yên rewa û dadimend ji sînorên ku peymana Sîvir nîşan kirî bêtirî wê jî diyar û xelatî we bikin .! Ji ber ku Atatirk konevanekî pêlewan û hişmend bû lewre jî di destpêka tevgera xwe de bi awakî demuqras û mirovanî bi gelê Kurd re dida û distand , ta di hundir civatên xwe yên ne aşkere û taybet, bi hevgirtina tereqî de jî mafên Kurd di hundir Tirkiyê de û hemû tevgera rêzgarîxweza kurd dipejirand û pîroz dikir . Loman jî, Kurd bi gotin û dirûşmên olî û balkêş bi hêsanî dihatine xopandin , bê erê û na



bawerî bi wî dikirin û bi hezaran li derdora Atatirk diciviyan berên xwe didane şer, bi navên (cangoriyên Kurd ), vêca jî li dijî Yonan şer û ceng lidardixistin . Wisan jî , li dawî bi darê zorê Yonan ji xaka Tirkiyê derdixistin, bi vî awî dewleta Tirik li ser pişta Kurdan ji nîrê dagîrkerên Îngilîz û Yonanê rêzgar dibûn . Lê mixabin temenê gotin û peymanên Atatirik dirêj nedikir . Piştî dewleta Tirik ji dagîrkerên Îngilîz û Yonan paqij û rêzgar dikir û pirsgirêka Ermenî jî bi nijadqurî bin cil dikir , bi vê awî li ser lingên xwe disekinî , pişt re bê şerim û fedî berê xwe dida Kurdan û ew bi qurşîn ,çekên sipî , girtin û H,W.D xelat û diyar dikir . Piştî wê Atatirik têkiliyên xwe bi dewletên xerbê re li saz dixistin , daku peymana Sîvir ya di sala -1920- an de ku çarenûsiya mafên gelê Kurd tê de hatibûn pejirandin , divê ew bête pişafitin û tinekirin. vêca jî ew peyman li dawî dihate çirandin û li şûn wê lihevkirina Lozanê di sala -1922-an de cî digirt û dicespî , ango jî , li

D.R.( 10)

www.arsivakurd.org

## Hişmendiya Xecê

Xec bi çûkanî li şûn dê dimîne, Keçek çeleng û bîrewere. Rojekê bav ji çolê vedigere, bi rê de, pêrgî rêweyekî dibe. Rêwî dibêje : Apo, rê dûre, ka ez hinekî te hilgirim û tu hinekî tu min hilgire, ta rê li me nêzîk bibe.
Bavê xecê bi hers dibêje: Ma ez kanim te higirim?.
Piştî demekê rastî zadekê şîn tên, rêwî dibêje : Apo, xwediyê vî zadî xwariye an na?.Bavê Xecê di xwe de dikele û dibêje: Ma te nediye ku ev zad şin e?.
Li ber dergehê gund rêwî dibêje: Apo , mala Xweda li ku ye?. Bavê Xecê her dere bi hers dibe , dibêje: Ma ez çi zanin mala Xweda li ku ye?.
Gava bavê Xecê digihe mal , Xec dinihêre ku bav xemgîne. Çi bi sere te hatiye bavo?. Bav çîroka xwe û rêwî ji Xecê re dibêje.
Xec dibêje : Bavo , mebesta rêwî ev e: Gava gotiye ku ez te hilgirim û tu min hilgire, yanê ez bipeyivim û hinekî bipeyive. Ya din ku xwediyê zad dindar be, yanê zadê xwe Pêş ve xweriye, û siyem , mala Xweda mizgeft e.
Wî hingê bavê Xecê li xwe poşmam dibe.
Xewc bi lez diwazdeh hêk kelandin û heft nan xistin çiqinê û gote bavê xwe . Bavo here vê çiqinê bide rêwî. Bi rê de, bav Nanekî û hêkekê dixwe. Li ba rêwî lêborîna xwe jê dixweze. Gva rêwî çiqinê vedike, dibîne yazdeh hêk û şeş nan in.
Rêwî dipirse: Abo sala we yazdeh heyv û hefteya we şeş roj in?.
Gava bavê Xecê vedigere Mal, Xec dipirse: Bavo rêwî çi ji te re got?. Bav dîsa Çîroka xwe ji Xecê re dibêje. Xec dibêje bavo te bi rê de nanek û hêkek xwarî ye? . Bavo , here rêwî bîne mal.
Piştî rêwî demekê dibe mîvanê Xecê . bi hev re dizewicin .

Ew gihîştin mirazê xwe wîn ji digihin mirazên xwe
*******************************

**Dumahîk: Gotina Encûmena…**

Li ber roniya biryarên kongir komîteyên hevdîtinan li derve û hundir hatin çêkirin û gelek hevdîtin bi hêzin Kurdî , hêzên niştimanî yên Sûrî , dewletên Ereb û navdewletî re hatin girêdan .
Ji wan hevdîtinan , hevdîtinên , ku bi encûmana gel ya rojavayî Kurdistanê re çêbûne , di encama wan hevdîtinan de derxistina belgeya lihevkirinê bû . Ewê ku naveroka wê lihevkirina rêzanî û çalakiyên li ser erdê ye . Lê mexabin ta neha baş cî negirtiye û emê her bi şopînin ta ku cî bigre . Ji ber ku em bawerin , ku bicîkirina naveroka wê di xizmeta bercewandiya gelê me û şoreşêa Sûriyê de ye . Lê ev civîna dawiyê di navbera herdu encûmanan de , li Erbîlê hatiye girêdan û tekûzkirina , geşkirina bi karanîna belgeya lihevkirinê hêviyan bilind di ke .
Li dawiyê em bi nave E.N.K S , beşdarbûna we spas dikin . Em ji gelê xwe dixwazin , ku li dor encûmana xwe bi civin .

*Heleb 14/6/2012an*
***ENCÛMENÊ NEŞTUMANÎ KURD***
***LI SÛRIYÊ - HELEB -***



www.arsivakurdi.org

# Gotina Komela Rewşen Bedirxan Ya Jinê Di Bîranîna Damezrandina Yekem Partiya Kurd Li Sûriya

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê- Encûmena Efrînê bi bûneya damezrandina Partiya Dêmokrata Kurdistan li Sûriyê ,di roja 15.06.2012 an de fêstîvalek mezin bi amedebûna cemawerê Çiyayê Kurmênc li darxist , Bêrîvan Îbo bi navê (komela **Rewşen Bedirxan** ya jinên Kurd Li Efrînê ) peyva pîrozbahiyê di festîvalê de xwend.

**Endamên Encûmena Niştimanî Kurd li Sûriyê !....**
**Hemû Partiyên Kurd li Sûriyê !....**
**Cemawerê gelê Kurd li Çiyayê Kurmênc ! …**
Em (Komela Rewşen Bedirxan ya jinên Kurd li Çiyayê Kurmênc ) bi bûneya damezrandina (Partiya Dêmokrat a kurd li Sûriyê) di 14 . Hizêranê , sala 1957 an de we pîroz dikin.
**Welatparêzên têkoşer !**
Wek hûn hemî dizanin , dîroka Firansa li Sûriyê reş bû, ewê cidabûn ne dikir navbera gelên Ereb û Kurd , lewra gelê Kurd jî mîna azadîxwazên Ereb bi hemî kanînên xwe li dijî koledara Firansa têkoşîna xwe ya dadmend dikir û ji bo azadiya Sûriyê bi camêrî pir qurban pêşkêş kir.
Lê piştî ku Sûriyê ji koledara Firansa rizgar bû, destlatdarên Sûriyê pir zû gelê Kurd ji bîr kir û ewanan nexwastin vê nasnam me ya netewî nas bikin , bi ser vê de jî, destlatdarên li duhevhatî zordarî û setemkarî li miletê me dikirin. Di encama vê bindestî û ne wekheviyê de, hin siyasetmedararên Kurd mîna nemir Osman Sebrî , nemir Reşît Hemo,rêzdar Ebdil Hemîd Hac Derwîş, Dr. Xelîl Mihemed û hin din di 14 .H izêranê ,sala 1957 an de (Partî Dêmokrat a Kurd li Sûriyê) damezrandin .
Di rstiyê de, ji sala 1965 an de û mixabin gelek partiyên me yên siyasî li Sûriyê ava bûne, lê van partiyan têkoşînên xwe li dijî hemu destlatdarên şoven , regezperest berdewam kirin û ewanan bi qaserî kanînên xwe li dijî pirojeyên regezperest wek hejmartina awerte ,kembera Erebî û erebkirina navên gundên Kurdan bi tundî rawestiyan.

**Gelî beşdaran !**
Niha bû ye ser çel sal re , gelên Sûriyê Ereb , Kurd û kêmnetewên din di bin sîbera destlateke zordar, kevneperest û regezperest de dijî , lewra cemawerê komara Sûriyê li seranserî welêt ji 15. Avdara 2011 ê de û ta roja îro di rewşeke şoregerî de dijî , bi 10 hezaran hemwelatiyên Sûriyê ji bo azadiyê , dêmokratiyê û wekheviya gelan pakrewan bû ne .
Em weke Komela Rewşen Bedirxan ya jinên Kurd li Çiyayê Kurmênc pêkanîna dêmokratiyê û azadiyê tenê di hilweşandina rêcîma Bes de dibînin , lewra em jî, bê dudilî piştvaniya şoreşa Sûriyê ya aştiyane dikin û dengên xwe bi hemî dayikên Sûriyê , bi hemî saziyên jinan li Sûriyê û bi hemî patiyên azadîxwaz li Sûriyê re bilind dikin û dibêjin :_ Bijî azadiya gelên Sûriyê !
Bijî dêmokratî û wekheviya hemî gelan li Sûriyê û li CÎhanê!.........

**Her bijî pakrewanên azadiyê li Sûriyê û li hemû cîhanê !.....**

**Her bijî nemirên Kurd li beşên Kurdistanê ! ……**

**Her bijî hevkariyên gelê me li dijî zordarên welatê me !.......**

www.arsivakurdi.org

# Gotina Encûmena Niştîmanî ya Kurd Li Sûriya Bi Boneya Damezrandina Yekm Partiya Kurd Li Sûriya- Heleb

Mîvanên rêzdar ….
Xwîşk û birayên beşdar …
Rêz û Silav ….
Weke hûn dizanin ,piştî serbestbûna welatê me Sûriyê li 17î Nîşanê 1946an , ji bin nîrê Firansa , bi çend salan , heyamek demoqretîk li Sûriyê peyde bû . Gelê me yê Kurd , di wê karnavê de sûde ji wê heyama heyî dît û hin komele û navendên rewşenbîriyê damezerandin . Lê mexebin wê heyamê nedomand , û li şûna demoqrasiyê , ramana şofînî , zor û bindestiyê li seranserî welêt cî girt . Em Kurd jî yek ji bêtirîn neteweyên , ku ew siyaset û pirojeyên şoven û awerte li ser hatine meşandin û îşkence û çewsanidin kişandine û ta neha jî ,ji ber dinalin . Wê lomê ji ber vê yekê li alîkî , belavbûna ramana rizgerkirina milet û welatan li cîhanê û bandora tevgera rizgarîxweza Kurdistanê û bi taybetî ya Kurdistana başûr ; Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd li Sûriyê , li 14î Huzêrana 1957an , biryara damezarandina yekemîn partî bi navê ***EL PARTÎ*** standin , ji bo bi destxistina mafên netewî yên rewa ji gelê me yê Kurd re .
Xoşwîstên delal ….
Mîvanên rêzdar ….
Weha ***EL PARTÎ*** xebata xwe berdewam kir , vê re , û bi taybetî piştî bidestxistina destlatê ji aliyê partiya EL BEIS li sala 1963an û di dûre hatina serok komar Hafêz Elesed li sala 1970ê ; herçû çewsandin , kuştin , giritin, îşkencekirin û zulim û zor li ser gelê Sûrî û bi taybet yê Kurd bû .û Sûriyê di pir firk û reweşgehan re derbas bû , ta gîha hevdema buhara Erebî , û li15/3/2011an şoreşa Sûriyê dest pêkir , û hêzên rikber li Sûriyê û tevgera me ya Kurd jî di nav de sergêjî û ji dûzanê kir, lê hêjaye em bi bîrwînin , ku gelê Kurd ji pêşî de deng bi xwe xist û tevlî şoreşê bû , herweha tevgera Kurd jî bi helwesta xwe ya rêzanî- bi navê koma partiyên Kurd – pêre bû , û dest bi dan û standinê bi rikberiya niştimanî , çi hêz û çi kesên ser bixwe re kir ji bo serhevdina wê , zelalkirina pirsa Kurdî li Sûriyê û çareserkirina pirsa Sûriyê bi tevahî , lê mexebin ji ber pir sedemên hundir û derve , ew rastî, xemsarî û pîştêyaldanekê hat.
Li rex wê demezrandina lêvegergeha Kurdî , ji bo gelê me yê Kurd û serkeftina şoreşa Sûriyê pêwîst hate dîtin , û xebatek bê hempa ji ber ve hate kirin . Ta ku li 26/10/2011an kongera Kurdî ji aliyê hin partî , kesên serbixwe û hevrêzên xortan de hate li darxistin û encûmana Kurdî hate damezrandin.
Di encam de , gelek biryar hatin der , ji wan evên jêrînin :
1-pêwîste Sûriyê bibe dewletek demoqratîk, perlemanî ,Şariştanî û cûrecûr netew û ol .
Herweha rêzgirtina belgeyên navdewletî û perensîpên mafên mirovan bigre .
2-Hebûna gelê Kurd li Sûriyê , ziman û mafên wî yên rewa bi awakî fermî û destûrî , li gor peyamên navnetewî yên dewletên demoqrat û li ser bingeha nenavendiyê erê bibe .
3-Zor pêwîste Şoreşa Sûriyê aştiyane be , û rewşa ku Sûriyê guhayê sûcê rêjîmê û ew di ber de berpirsyar e .
4-Hate tekûzkirin li ser serxwebûna biryarên hêzên niştimanî di çareseriya pirsa Sûriyê de .
5-Li ser xweşkirin û pihêtkirina têkliyên encûmena Kurdî bi hêzin Kurd ên derveyî wê re , ji bo yekirina pirojeya Kurdî ji her alî ve , hat tekûzkirin .
Xwîşkino , birano …. **D.R. ( 7 )**

www.arsivakurd.org

# Saziya Fêrkrin û Parastina Zimanê Kurdî Li Sûriyê Konfiransa Salane ya bajarê Helebê li dar xist

Li 30.5.2624 K – 2012 Z , S . F . P . Z . Ks bi beşdariya mamosteyên zimanê kurdî yên saziyê li bajarê Heleb û hin mîvanên hêja mîna mamoste Ronî Elî û Reşît Ebas konfransa xwe ya salane li dar xist .Konfirans bi pêşewaziya beşdaran û kêlîkek bê deng li ser giyana hemî kesên jiyana xwe ji bo ziman û çanda kurdî ji dest dane û pakrewanên azadiyê û rûmetê dest pê bû . Di dû re , rapora rêvebiriya saziyê ya bajarê Helebê hate xwendin , paşê jî ji aliyê mamostên beşdar ve , rapor hate şirove û rexnekrin . Di nav re jî , gelek pirs ji rêvebiriyê hatin kirin , û bersivên wan pirsan ji aliyê rêvebiriyê ve hatin dandin . Di encam de , gelek biryar û pêşniyar hatin kirin , ew jî ev in :

1- Gereke sazî di fêrkirnê de , bêtir berê bide zarok , ciwan û jinan .

2- Pêwîste pirtûka destpêka rêzimên were guhertin an yeke nû were amedekrin .

3- Çêtire weşanek li ser zimên bi navê saziyê derkeve .

4- Eger cîgehek Enternêtê yan rûpelek fêsbûkê bi navê saziyê hebe baş e .

5- Berferhkirina saziyê û pirkirina mamostên wê li bajarê Helebê hewcedariyek e .

6- Pêşinyar ew e , ku pileyên fêrkirina abe û destpêka rêzimên bi bin yek û fêrname piştî destpêka rêzimên were dandin .

7- Roja 15 Gulanê– yê ku wek cejna zimanê kurdî hatiye binavkirin – bibe roja çalakiyên ji bo zimanê kurdî .

8- Pêwîste endamên rêvebiriyê li korsên fêrkrinê hin caran bibin mîvan .

9- Di herdu heyvên Tebax û Tîrmehê de , divê sazî – çi qas ci were – korsên fêrkirinê li bajarê Helebê pir bike .

Li dawiyê , biryar hate standin , ku sazî rêznamakê bide herdu mîvanên beşdar , ji ber xebata wan ya berbiçav di ber zimanê kurdî de . Her wiha komîtak rêvebiriyê ji saziyê re , li Helebê hate hilbijartin , û bi xatirxastinê ji beşdaran , konfirans hate bi dawîkrin .

**S . F . P . Z . Ks**
**Ya bajarê Heleb**

**Dumahîk : Sambola..**

ser bingeha berjewendî û bêbexitiya van dewletan mafên Kurdan winda û bin cil dikirin . Lê gelê Kurd, li pêş vê bêbexitiyê serî neditewand û bê hêvî nediman, lewre jî , di sala -1925- de şoreşa xwe di herêma Diyar-Bekir (Amed) , Orfê û Mardînê de bi serkêşiya pakirewanê gelê Kurd Şêx Se,îd pîranî lidarxistin .Lê Atatirik bi hovîtî ew şoreş perçiqand û bi top , tiving û bafirokan bajiar û gundên Kurdan kavil û wêran kirin . Bi wê tenê nedikir, pêlanên xwe digerandin û berê xwe dida dewleta Firansa ta ku riya hesin ya Helebê li pêş wan bête vekirin .Pêwîste were zimên ku hîngê Firansa dewleta Sûriyê dagîr kiribûn . Loman jî daxweza Atatirik li rex dewleta Firansa cî digirt û riya hesin li pêş wan dihate vekirin , hîngê Tirkan -100,000-hezar leşker bi ser gelê Kurd de dişand, tevger û şoreş dihate rûxandin û -45- kes ji serok û rêberên Kurdan dihatine girtin û -28-ê Hizêrana sala -1925-an de Şêx Se,îd û dikitor Fo,ed di gel hevriyên xwe ve heyif û mixabin ew bi bêbexitî têne darvekirin . Lewre jî wan di nêv refên pakirewan û nemirên gelê Kurd de cî digirtin û îro ew bi şahinazî ji neviyên xwe re bûne sambûla pêdarî û rizgariyê.



www.arsivakurdi.org

**Dumahîk :** Şoreşa …
sedemên sereke, wek :
- Hêza rijîmê ya aborî û leşkerî, kêm zêde li cî ye, di siha piştgiriya xurt ya hin dewlet û rêxistinan jê re, û kiryarên wê yên hovane.
- Beşek mezin ji civaka Sûrî û bi taybetî ji hindikahiyan, hîn tevilî tevgera rikber û şoreşê nebûne, ji bilî ku, hinek li kêleka rijîmê mane.
- Nezelaliya stratijiya şoreşê li ser paşeroja Sûriyê, li aliyê din, tevlehevî û aloziya di tektîk û şêweyên xebata gelêrî, yên aştiyane û demokras, ya ku berpirsiyariya hemû partî, komîte û encûmenên rikber e.
- Nelihevkirin, keysebazî û berjewendiyên partîtî û kesayetî, ya di nav beşên rikberiya Sûrî de - bi taybetî di nav yên derve de – yê ku nehiştiye rikbera Sûrî bighêje hev an kongirekî tevahî lidarxe, da ku nûnertiya gel û şoreşê bike, çalakî û livên serhildanê biparêze û pêşxe, û ji rewşa paşerojê re amede be.
- Heyama herêmî û navnetewî nediyare. Dewletên dibêjin piştgiriya şoreşê dikin, wê di ajotina rêbazeke erênî ji çareseriyeke siyasî re, bigihên biryar û pêngavên rast, dirust û dilsoz.
- Çekirina şoreşê li hin deveran, hişt ku çavsorî û hovîtiya rijîmê zêde bibe û rewayekê - kêm zêde - bide çareseriya ewlekarî - leşkerî, rijîm ragihandin û namên xwe ji wê çîroka hebûna (terorîstan) dagire. Di dema ku çekdar nebûne hêzeke xurt û mezin ta karibin li hember leşkerên dewletê bisekinin, yan hin dever û bajaran bidestxin, tê de bi ser kevin .

Mirov dikare bêje, çendî hêzên rikberiya Sûrî li hev bin, li dûrî lîstik û xefkan bin, li dûrî berjewndiyên taybetî bin, li dûrî cureyên çekdariyê bin, di hundir welêt welêt de girîngiyê bêtir bidin xebata gelêrî, aştiyane û demokrasî, wê di xizmeta gelê Sûrî de be û serkeftina şoreşê wê nêzîktir be.
Ji kovara Agirî hejmar 184 hatiye grtin.
*** Jêder: Rojnama Agirî – hejimar /185/**
*************************************

**Dumahîk : Nêrînek ji**
kiriye.Ta ku, ev rûdawa serberdabûna asayî , bûye weke pîrkaboskekê , daye dû hemwelatiyan di pêdiviyên jiyana wan de û bi kûve çûn û hatin. ⍰ mînakên tunebûna mazot, gaz û nên û buhabûna nirxên tiştan encameke ji encamên wê ye .

Bi navê rêxistina Heleb a partiya Yekîtî ya demoqrata kurd li Sûriyê , em dibêjin: na ji hemî wan rûdawên tundûtûjî û serberdayînê re, ji karanîna çekan û bombekirinên deverên xelkên sîvîl lê hene de bigir û ta bûyerên dizîna mirovan û berdêla wan bi peran yan jî kuştina wan bi şêwekî tewşankî , û şermezarî ji wan hemî kiryarên kirêt û nemirovane re .

Di vê çarçewê de , em girîng û erk dibînin , ku em bang li hemî berketiyên bajarê Heleb û derdora wê çi kurd çi Ereb , turkman ….û çi misilman û mesîhî li ser paşeroja welatê me Sûriyê û serkeftina şoreşa wê ya aştiyane û pîroz bikin, ku haj xwe bikin û bi van ton kiryarên kirêt û gemarî re neşimitin û nekevin wê dehf û avgira ku jêre tê pilankirin .Ji ber ku ew ton kiryar ziyanê dighînin armancê û nav dengê şoreşê yên pîroz, û di encamp de – bê gûman – xizmet dirêjkirina temenê vê rijîma setemkar û zorker dike.

**Rêxistina Heleb a partiya yekîtî**
**Ya Demoqrat a kurd li sûriyê**

www.arsivakurdi.org

# Şoreşa Sûriyê li ku ye?

**Ş. Dado**

Dîroka Sûriyê ya nûjen tijî ye ji nakokiyên navxweyî. ji bo destxistinakarbedestiya dewletê li beramber destdirêjiyên hêzên cîhanî - bêgûman dûrî maf û berjewendiyên gel an bikaranîna demokrasiyê û mafên mirovan - di dema ku partiyên siyasî, îdolojî û totalîter bûn ji bilî partiya Kurd li Sûriyê ya ku, ji roja damezrandinê ve (14 Hizêran a 1957 an), dirûşma demokrasî û mafên mirovan bilind kiribû, nemaze di heyama şerê sar de, parta Be'is ya ku li ser îdolocî û ramana netewî avabûye, di 8 Avadara 1963 an de, destê xwe danî ser destlata dewletê û siyaseta tekpartî birêvebir, li dijî hêzên dî rêça tunekirin, zîndankirin, tund û tûjî, û li serê Kurda siyaseta şoven û nijadperestiyê bikaranî .

Ango, rêjîmek stemkar û nedemokrat li dirêjahiya nêzî pêncî salî di Sûriyê de avabûbû, ya ku bi xwe re pir astengên siyasî, civakî, aborî û çandî anî, bê ku çirûskên guhertin an çareserkirinê hebin, ta ku Sûriyê gihişte vê rewşa nuha ya nazik û tarî, ya ku alava tund û tûjî navnîşana wê ye, Mîna kuştin û şehîdbûna bêtirî yanzde hezar kesan, birînîkirin, koçberkirin, girtin û zîndankirina deh hezer kesan.

Kiryarên rijîmê li dijî xelkê Sûriyê bêtirî salekê ji temenê şoreş a pîroz, pileya ( tewanbariyên li dijî mirovahiyê ) derbas kirine. Yên ku pir raghandin, rêxistin û hêzên hundir û derve, cureyên wê dîtine û bi nav kirine, lêkolîn û belge li ser çêkirine, bi taybetî komîta mafên mirovan ya Neteweyên Yekbûyî û raporên berdevka wê xanim Nafî Bîlay a ku daxwaz kiriye ku Encûmena ewlekariyê ya navdewletî bilez bilive û zorê bide ser rijîma Sûriyê, da ku, darê tundiyê, kuştin û lêdanê rawestîne, û berpirsiyarên wê li pêş Dadgeha Cînayeta navdewletî werin gunehkirin. Lê, ji ber Vîtoya Rûsiye û Çînê, wê Encûmenê di çerçewa tevliheviya nakokî û berjewendiyên herêmî û navnetewî de nikarîbû tiştekî bike. Ji alîkî din ve, piştgiriya Îran û Rûsiya ji rijîmê re, û helwesta Turkiyê yê çirûk (carina germ û carina jî sar), li kêlek aloziya liv û hêza Elcami'a Elerebiyê di warê bikaranîna bendên nêrîn û pirojeya xwe ya ji bo Sûriyê.

Piştî herikandina xwînê û malwêrankirina xelkê bi destê hêz, leşker û dûvçilkên ( şebîhên ) rijîma zordar ya ku, di ûstandinabi vê rewşa nû re ji bilî rêbaza ewlekarî - leşkerî, lêxistin û kuştinê, tiştek din naşopîne,… Nema dem paşve vedigere û kîjan rojê be wê Şoreşa Azadî û Rûmetê bi ser keve . Lê mixabin, digel keftelefta Kofî Enan, tu çareserî balkêş û rast, di demek nêzîk de , ne xuya û ne jî aşkere ye ku wê qelengê serkeftina serhildana gelê Sûrî bilind be, ji ber hin **D.R. (11)**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org